zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

## KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal: 1986

28

www.arsivakurdi.org



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E



www.arsivakurdi.org

HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇÎROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

KULÎLK


www.arsivakurdi.org

# GUR Û ROVÎ


Carek ji cara,rahmet li dê û bavê hazir û guhdara,ji dervî cendirme û tahsîldaran.

Hebû gurek,kîroşkek,rovîyek,kewek û kerek. Evê me jimartin rojekê li hev kom bûn û derketin ser bêndera. Şevek tava heyvê bû babîsokek li wan rabû û hemû ketin çalek ê. Ji ber çal gelek kûr bû,nema dikaribûn jê derkevin. Bi rojan di çalê man. Gelek birçî û perîşan bûn. Evarekê gur û rovî gazî hevalê xwe kirin û gotin:





-Gelî hevala ! Em li vir birçî man,emê nuha her yek navê xwe bêjin,navê kê nexweş be emê wêna bixwin.



Pêşîyê kerê got:
-Ez kerim,
guh çepelim,
xweş nav,
nexweş nav...


www.arsivakurdi.org

Gotin:

-Nexweş nav û ketin ser kerê û ew xwarin.

Her go goştê kerê dixwarin,rovî hestî kom dikir û ji bo xwe vedişart.

Goştê kerê nema. Dor hat ser kîroşkê.



Kîroşkê got:


-Kîroşkim,
nermo goştim,
xweş nav ,
nexweş nav...

Gotin:

-Nexweş nav û kîroşk jî xwarin. Dor hat ser kewê.

Kêwê got:

-Kewim,
qirik bedewim,
xweş nav ,
nexweş nav...



Gotin:

-Nexweş nav û kevoka reben jî xwarin.

Çend roj derbas bû, birçîbûnê dîsa destpêkir. Rovî çû ket ser hestîyê kû veşartibû û kir kire-kir.

Gur bangî rovî kir û ji re got:

-Birakê rovî, ma tu çi dixwe ?

Rovî lê vegerand:

-Ez lingekî xwe dixwim.

Roja din, rovî dîsa kire kir û xwar.

Gur dîsa bang kir û got:

-Birakê rovî, ma tu çi dixwe ?

Rovî dîsa got:


-Ez lingê xwe dixwim.

Bi vî awayî gur jî di çar rojan de her çar lingê xwe xwar.

Rovî ket ser gur û tiştê kû jê mayî xwar...Dure qevzek da xwe û xwe çenkir û ji çalê jî derket...

Berevkar: Bavê Çeto

QUNCIKA XÊZIKAN



www.arsivakurdi.org

## EY XWENDEVAN

Roja nû derket ji çîya
Cîyê wan bin darê bîya
Xwendevano tu napirsî
Li wan esîr û girtîya.

Gundî ezim,karker ezim
Kurdo ezim,girtî ezim.

Ji ber derda dil êşîya
Ji êşa dil por weşîya
Xwendevano tu napirsî
Wan navê me kir eşqîya.

Gundî ezim,karker ezim
Kurdo ezim,girtî ezim.

Baznê reş kir dest û pîya
Zîndan tije ji girtîya
Xwendevano tu napirsî
Li wan mêrê pişt derîya.

Gundî ezim,karker ezim
Kurdo ezim,girtî ezim.

Şaxê Ciwan

KURDİSTAN

www.arsivakurdi.org

# X A P Î N O K

Gava em zarok bûn û me dilîst,ji bo ku me hevdû "bixapanda" me ev tiştana ji hevdû re dipirsî. Pêwîst bû,ku em wan tiştana li ser hev bêjin,da ku zimanên me nequlipîne û em şaş bêjin.
Wek gelek tiştên me,ew jî hedî hedî tên ji bîrkirin. Ji bo wê yekê,mi çend heb dan hevdu û ji we re dişînim.
Bi gelek silavên biratî...

Bavê Hêvî

---

-1-

Ez çûm mera mala mele remezan,
Mi go kanî mera mala mele Remezan,
Go va ye,mera mala mele Remezan.

-2-

Kurm,qurm  qulkir.


-3-

Rêvî li rê lezand, rê li rêvî lezand.


-4-

Dîya mi girikek hilkir, mi serê girika wê xwar.


NAVE VAN HEYWANAN LI BINÊ WAN BINIVİSIN



.............




.............



.............




.............



.............



.............



.............



.............



www.arsivakurdi.org

QUNCIKA MUZÎK Ê.

Notenivîs : Cemîla Celîl

## HEY LAWÎN 14.




Hey lawîn, lawîn, lawîne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

Min sê peya deştê dîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min sê peya deştê dîne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

Hersê peya celalîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Hersê peya celalîne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

T'ivingê mila e'ynelune.
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

T'ivingê mila e'ynelune.
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

Zozanêd me cot kanîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Zozanêd me cot kanîne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

Min ji kanya gul çinîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min ji kanya gul çinîne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

T'ilya lawik ew bir̄îne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

T'ilya lawik ew bir̄îne,
Hey lo, lo, kur̄o min lawîne.

Min şandye h'ekîm bîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.



www.avestakurdi.org

## KEÇIKA TEŞÎRÊS

Hebû keçikek,ji kar hez nedikir û gelekî teral bû. Bi xwer nedidît,ku xweşikî tiştekî bike. Lê baver kir,ku bi vê rewşê ewê di mala bavê xwe de bimîne.

Ji bo wê yekê,pêwîs dît,ku xwe bi awakî wilo têxe çavên hineka,da kû yekî ji xwe re bibîne û pê re bizewice.

Lewra,Keçik helawîyekê çêdike û datîne ser milê xwe. Ji alîyekî teşîya xwe dirêse û ji alîyê din jî zimanê xwe dirêjî helawîyê dike,da ku xuyanî bike,ku hîngî karkire û wext nabîne.ku nan bixwe.

Rojekê, zilamekî bezirgan di ber mala keçikê re derbas dibe û Keçikê dibîne.

Bezirgan bawer dike,ku keçikek gelek karker e û radibe wê ji xwere tîne.

Gava bezirgan ewê here bezirgantîya xwe, hundir tije hirî dike û ji jina xwe re dibêje :

-Ez deherim bezirgantîya xwe.Hata ez vegerim malê,dibê ew hirîya hatibe rêstin û bûbe gulok.

Keçik,bêçare wek berê dike: him teşîya xwe dirêse û him jî pelûla xwe dixwe.

Qîza mîrê cina jî,kûnêrek di sutyê wê de hati bû û dikirin û nedikirin jê re tu der-



www.arsivakurdi.org

man nedidîtin. Gava ku Qîza mîrê cinan li çav wê rewşa keçikê dikeve,kenek wê digre û dike û nake nikare kenê xwe bisekinîne,heta kû kûnêra wê derb dibe. Bi derbûna kûnêrê, ew rehet dibe.

Bavê wê soz dabû,ku kî qîza wî rehet bike,ew çi bixwaze ewê bîne cî.

Mîrê cinan dihere cem wê keçikê û jê re dipirse,da ku bizanibe şert û daxwazê wê çî ye.

Keçik dibêje:

-Bes alî min bikin,ji bo kû em vê hirîye gişî birêsin û bikin gulok.

Cin alî keçikê dikin û wê hirîyê gişî dirêsin û dikin gulok.

Bezirgan gava tê malê,dibîne ku jina wî karê xwe pêk anîye.Bezirgan,bi wê yekê gelek kêfxweş dibe.

Bezirgan dîsa hundir tije hirî dike û ji pîreka xwe re dibêje:

-Ez dîsa dieherim bezirgantîya xwe.Heta ez vegerim malê,dibê ev hirîya giştik hatibe rêsandin û bûbe gulok.

Keçika reben dinere,bi wî awayî nikare biqedîne û ji bê çaretî dest bi girî dike. Bezirgan meraq dike û jê dipirse:

-Xêre,ma tu ji bo çi digrî?

Keçik dibîne,ku kêzikek di wê derê re derbas dibe.Bi dîtina kêzikê,fikrek tê bîra

wê û bersîva mêrê xwe dide:

-Ma tu wê kêzika han dibîne? Ew xaltîka min bû. Hingî wê jî teşî rêst,rêst bû kêzik. Ger ez jî teşîye wanî birêsim,ezê jî bibim wek wê û bibim kêzik.

Bezirgan,ji wan gotinên wê bawer dike û keçik bi wî awayî xwe ji teşî rêstinê xelas dike...

Berevkar: PÎRO


www.arsivakurdi.org

NAVE WANAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN





............ ............





............ ............

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA PÊZANÎN Ê.

Pirs: 1
Zîq zîq,heyşt ling û du pîq, çî ye ?
Bersîv: ...........

Pirs: 2
Tişkî min heye; şewq-dide avê û şil nabe,
ew çî ye ?
Bersîv: ...........

Pirs: 3
Tişkî min heye; ji ezman dikeve naşkê,dike-
ve nav du keviran dişkê,çî ye ?
Bersîv: ...........

Pirs: 4
Tişkî min heye; merov davê jor sipî ye,li
erdê dikeve zer dibe. Çî ye ?
Bersîv: ...........

Pirs: 5
Tişkî min heye; tum û tum axê li serê xwe
dike,çî ye ?
Bersîv: ...........

# QUNCIKA DURIKÊN ZAROKAN

-1-

Yekê,yekanekê,
Gula çepê,çepil mijo,
Xana gizo,heba tirî,
Vegindirî,çam û çeyî
Qul,qule ye,
Dora te ye.

-2-

Hê deqê,deq da şîmê
Kumê têtî,aravêtî ,
Haro, maro, kurtêlo.

( Bavê Çeto )

-3-

Hêkê mêkê
Qitka çêkê
Hafiz belo
Textê Şelo
Ta tu.

( Bavê Hêvî )

www.arsivakurdi.org

-4-

Keçê, keçê vingê
Ser seradê, bin bêjingê
Tu b' Îsa kê, tu b' Musa kê
Muhammedê Mustefa kê
Tu kêz xatûnê ji xew ranakê

-5-


Çîrokê, çîvanokê,
Xet, xetokê,
Elîyê Romê,
Berda komê
Kom şexitî
Golka xala
Li pişt mala
Ne gur duxwe
Ne diz dibe
Bi xwe tê mala...

( Dayka Dersim )



www.arsivakurdi.org

# M I J Û L Î



Gelo, ew mêşa hunguv di kîja rîye de dikane xwe bighîne çîçekan ?

## GUL NÎŞANA EVÎNÊ YE.

Gulum gulum,gul çîçek im.
Gula minê gul zerînê,
Aqlê lawka direvînê,
Dilê keçka diêşînê.

Benda te mam sal û meha,
Aqil û sevda bi mir nema
Dilê min bi vê evînê
Herdem diêşe bi sal û meha

Lê keçikê derevînê,
Çima serê min diêşînê
Birîna min bê derman ma,
Ez diêşim bi axînim.

Were carek li ba min rûne,
Birîna min tu buxrîne,
Desta ji ser çavan dîne,
Carek dinê te bibînim.

ŞOREŞ

( Bavê Ahmed )



www.arsivakurdi.org

## NAVE VAN FEKÎ Û ŞÎNKAYAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN



...............




...............




...............



...............




...............



...............



...............



...............

www.arsivakurdi.org

## SERPÊHATÎYEK

Du merov diherin Deştê, ji bo terş û dewaran ji xwe re bikirin. Havîn e û dinya gelekî germ e.

Her du dest birak li ber sîya mizgefta gund rûdinên û nanên xwe bi tisî dixwin. Zarokek di wêcerê re derbas dibe û wan dibîne.

Zarok dibêje:

-Gelî apan ! Ma hûn ji bo çi nanên xwe bi tisî dixwin ?

Merovek ji wan li zarok vedigerîne:

-Ji bo tiştekî din tune ye, ku em pê bixwin.

Zarok:

-Ma hun dimsê pê naxwin ? Ez dikanim ji were dimsê bînim.

Merovek dibêje:

-Ma ji bo çi em nexwazin!

Zarok dihere malê û qafikekî tije dims dike û ji wan re tîne. Her du merov wê dimse xelas dikin.

Zarok ji wan dipirse:

-Ma ez dîsa ji we re bînim?

Merovek dibêje:

-Ger hebe û ger tu dikanibe...

Zarok dîsa dihere malê û wî qafikî tije dims dike û ji wan re tîne.



www.arsivakurdi.org

Merovek ji wan meraq dike û ji zarok dipirse:

-Xortê delal! Ma gelo kesek li malê tune ye û yan jî tu bi dizî vê dimsê tîne?

Zarok li wan vedigerîne:

-Na welleh, ji bo mişk tê de mirî ye em naxwin.


Merov diqehere û qafikê lêwik li erdê dixîne.

Zarok dest bi girî dike û dibêje:

-Ihii,ihii,ihii,...We qafikê (hewdikê) kuçikê min şikenand.

MİRZE

# M I J Û L Î





Di nav wan herdu resman de 5 tişt ne wek hev in. Ma hûn dikarin wan bibînin?

www.asivakurdi.org

# PIRAMÎD

Gava bahsa Misirê dibe,berî her tiştî çemê Nîl û piramîdên wê tên bîra merov.

Me jî xwast,bi kurtayî em tiştna li ser piramîda mezelên Firewn û jina wî ji xwendevanên xwe re pêş kêş bikin.

Di rûpela berî vê de,me pilanên wê piramîdê çêkiribû.

Derîyê wê piramîdê di alî başûr de ye. Bilindbûna derî 1,20 M.ye,firehbûna derî 1 M ye.

Mezelê bin erdê: Ew mezel hata nuha nehatîye bikaranîn. Di nabêna mezelê bin erdê û derî de dehlîzek hey e,ew 98 metre ye. Ji devê derî piştî 19 metran dehlîzek din ji wê dehlîzê vediqete û dehere jor. Ew dehlîz 48 metre ye.Ew dehlîza dihere eywanekê. Ew eywana 47 metran dirêj e,8,5 metran bilind e û 2.15 metran jî fireh e.

Ji wê eywanên dehlîzek dihere mezelê firewn û dehlîzek jî dihere mezelê jina wî.

Mezelên Firewn,ji erdê 42 metran bilind e. Di piramîdê de,du kullek (rojîn) heye. Yek di eywanê de ye û yek jî di mezelê Firewn de ye...

# PIRAMÎD


1 : Mezelê bin erdê

2 : Mezelê jina firewn

3 : Mezelê Firewn


4 : Eywan


5 : Kulek (pixêrîk-rojîn)





www.a.siyakurdi.org

# XAÇEPIRS



9



4






5



7

www.arsivakurdi.org

BERSIVEN QUNCIKA PEZANIN E

Pirs : 1
Bi şev bûk e,bi roj pepûk e,ew çî ye?
Bersîv :.Lampe........

Pirs : 2
Dilîz e,dilîz e,na mîz e,ew çî ye?
Bersîv :..Taşî.........

Pirs : 3
Kumê delalê,gundirî neval ê,Ew çî ye?
Bersîv :..Teyrok.(Zîpik)

Pirs : 4
Teştek mast,guherek rast, ew çî ye?
Bersîv :.Hîv...........

Pirs : 5
Tuso kero,hevsar zero,li pê mi' wero,çî ye?
Bersîv :.Gundor.û.qeysik

Pirs : 6
Ker zirîya,buşkul firîya, çî ye?
Bersîv :.Tifing.......




www.arsivakurdi.org

# BERSÎVA XAÇEPIRSA HEJMARA BÎST Û HEFTA



1




2

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1↓ | N | A | L | ← 8 | | | |
| | Ê | ▨ | F | I | N | D | ← 2 |
| 3 → | Ç | E | L | O | K | | |
| 4 → | Î | S | K | A | N | | |
| 5 → | R | A | D | Y | O | | |
| | V | ▨ | ▨ | ▨ | ▨ | | |
| 6 → | A | N | T | E | N | | |
| 7 → | N | A | M | E | | | |



6



7



3




5



4



8




www.arsivakurdi.org

KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,


ME JÎ ÇÎROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULÎLK

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org




YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

**KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING**

**WEŞANA KOÇ - KAK**

**KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ**

ADRESS - **NAVNÎŞAN**

BOX 7031
163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM
SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS
: 10:- skr
BIHA

www.arsivakurdi.org